


# 3/2023 DCN NUÇENAME ٢٠٢٣/٣

• Weke saziyeke navneteweyî, em vê nûçenameyê – mîna rûpela me – bi çar versiyonên cuda pêşkêşî we dikin

- Deutsch https://www.jemal-nebez-stiftung.org/Deutsch/Newsletter
- English https://www.jemal-nebez-stiftung.org/English/Newsletter
- کوردی https://www.jemal-nebez-stiftung.org/pid_697244
- Kurdî https://www.jemal-nebez-stiftung.org/Kurd/Newsletter-Kurd

• Ji bo rêzgirtina Cemal Nabaz wek saziyeke ku ji aliyê kurdan ve hatiye avakirin û ji bo kurdan, me li ser xebat û jiyana wî ava kiriye, ku em dixwazin wê biparêzin û bi berfirehî pêşkêş bikin.

• Em rêxistineke yasayî ne û ji aliyê siyasî ve serbixwe ne û ne girêdayî ti partiyên siyasî ne. Komîteyên me bi awayekî xwebexş dixebitin. Ji bo proje û plansaziya xwe em xwe dispêrin alîkarî û bexşînan.

• Li gor yasayên Almanyayê em wek dezgeheke neqezenc tên naskirin. Alîkariyên ku em distînin li gorî yasayan têne xerckirin û eşkere kirin.

---

# Hevalên hêja yên Dezgeh Cemal Nebez, Kurdên hêja!

Ji bo kurdan û weqfa me, ev dem hema bêje nayê tehemûlkirin, ji ber ku -ji her demê zêdetir- ev mijar û daneyên dîrokî, ji ber êş û neheqiyên di Rojhilata Nêzîk de, di raya giştî ya cîhanê de bi berfirehî têne nîqaşkirin, ku kurd û welatê bav û kalên wan Kurdistanê ew bi neheqî û êşan ve rûbirû mane û mixabin, di asta cihanê de vî awayi hatiye piştguhkirin.

## Ji bo jenosîd û parçekirina neqanûnî ya neteweyek çandî ti qanûnek sînordar nîne

Medya, her roj êş û azarên kurdên li çaraliyê cîhanê, ku ew bi tena serê xwe van êşa hildigirin û ev êş nayên çareserkirin, tîne bîra wan; ev rewş jî bêtir biêş e.
Ev êş û neheqî, ango jenosîd û parçekirina neqanûnî ya miletekî medenî nayê jibîrkirin û bi dawî nabe.

# Di pêvajoya ji nû ve avakirina Rojhilata Nêzîk û Rojhilata Navîn ya di navbera salên 1920 û 1946an de Kurdistan.

Kurte-gerek li xala destpêkê ya eleqedar, Peymana Versailles ku Şerê Cihanê yê Duyem xelas kir.

Kurdistan, ku di dawiyê de li sê dewletnetewe yên nû belev bû– Tirkîye (1923), dewleta erebî ya Iraqê (1932) û taliye jî dewleta erebî ya Sûrîyê (1946) – bûbû beşek ji axa ku ketibû destê hêzên biserketî piştî radestbûna Împaratoriya Osmanî ya di sala 1918an de. Di vê xalê de ji berê de biryar hatibû dayîn ku ev xaka berfireh dê bi şêwaza dewletên netewe yên rojavayî were dabeşkirin û pêvajoya siyasî li destên du dewletan ji xeleka hêzên serketî bê dayîn: Brîtanyaya Mezin û Fransa. Serde jî, amadekariya damezrandina Cemiyeta Miletan, ku ji nav hêzên biserketî hin endamên din ên damezrîner dê bê dawetkirin, dihat kirin; Ev cemiyet, di heman demê de, dê piştgiriya rastker bikira ji bo her du hêzên mandayî ên ku di vê pêvajoyê de hatine tayînkirin, Brîtanya Mezin û Fransa.
Di destpêka sala 1920an de, ji bo parçekirina Kurdistanê sê şert û mercên li gor hiqûqa navneteweyî pêk hatibûn: Peymana Aşitiyê ya Versailles hat îmzekirin û erêkirin, her du hêzên mandayî bi karbidestiyên berfireh ve hatin destnîşankirin û ji bo alîkarkirina van hêzan Cemiyeta Miletan hatibû avakirin.

Lêbelê, piştî peymana agirbestê ya sala 1918an jî hin tişt xelet meşiyabûn. Şertên ku ji bo axa Asyaya Biçûk li ser Tirkên Ciwan (Jön Türkler / Young Turks) hatibûn danîn, li Rojavayê Anatolyayê, li Tengavan û li ser Deryaya Spî nehatin bicihanîn. Ev bû sedema Şerê yewnan û tirkan, ku ev şer wê demê ji aliyê tirkan ve weke şerê rizgariyê hat meşandin û di encamê de jî tirkan tengav ji nû ve bi dest xistin. Lêbelê ev yek, encax piştî serketina Jon Tirkên li Şerê yewnan û tirkan di Tebaxa 1922an de çêbû. Ciwanên tirk ên ku di bin desthilatdariya Atatürk de xurt bûbûn, êdî ne dixwestin ku peymana di sala 1920an de li Sevrê bi wan re hatibû mizakerekirin qebûl bikin, ku ev peyman bi hûrgiliyên avabûna Tirkiyeya nû ve bi dawî bûbû. Naveroka xala 12emîn ya "Çardeh Xal"ên Wilson a li ser xwerêveberiya "neteweyên berê mayî di bin desthilatdariya tirkan de" di Peymana Sevrê de jî dihate naskirin, her çiqas ew nehata qebûlkirin jî. Çawa jî be, Jon Tirkan êdî ji bo mizakereyên nû ser wan de diçûn. Rê li ber Jon Tirkan hat vekirin û di Hezîrana 1923an de Peymana Lozanê ket şûna bendên Sevrê de. Cemiyeta Miletan û ev hat qebûl kirin û Tirkiyeya nû di Cotmeha 1923an de hat damezrandin.

Tişta ku hatî pişthguhkirin, an jî girîng nehatî dîtin, ev bû ku biryara dayîna beşeke mezin a Kurdistanê, ya ku li rojhilatê Asyaya Biçûk, ji bo Tirkiyeya nû, kurdên li vê beşa Kurdistanê dijîn bêpar hiştin ku ew birehetî mafê xwe yê pêşveçûna serbixwebûnê bijîn.
Ji ber ku roleka vê xalê di damezrandina Tirkiyê de cih negirtiye û hêzên mandayî (desthilatdar) ên ku hatine tayînkirin ne xwedî ti şert û mercên di çarçoveya formûlekirina hin mafên ji bo kurdan e an jî parastina niştecihbûnê ya kurdan bûn, polîtîkaya li dijî kurdan

zêde bû; pêşî li Tirkiyeyê û pişt re jî li dewletên derdor, ku ev rasterast weke polîtîkaya qirkirinê tê binavkirin.

Dewletek din a ku ji aliyê Brîtanyayê ve hatî pêşniyarkirin ku bibe dewleteke netewe ya serbixwe, dewleta erebî ya Iraqê bû. Ew di sala 1932 de wekî monarşiya destûra bîngehîn ya ereb hate damezrandin. Kurdan li Başûrê Kurdistanê ji bo ku nebin beşek ji monarşiyeke ku padîşahê wê yê ereb ji devereke din tê, padîşahê xwe îlan kirin. Çîroka çawaniya çêbûna dewleta erebî ya Iraqê, ku Kurdistana dewlemenda petrolê jî di nav wê de lê bêyî îradeya kurdên li wir dijîn û herwiha bêçaretiya Cemiyeta Miletan ya li hember hêzeke desthilatdar ya ku îradeya xwe ferz dike, bi başî hatiye belgekirin. Kurdên Başûr li ber xwe dan, gule li wan hatin reşandin û hatin bombekirin; wan ev tişt protesto kirin, daxwazname pêşkêş kirin. Ji van yek jî bi kêrî tu tiştî nehat. Cemiyeta Miletan ev rewş qebûl kir û Iraq serbixwe bû. Lê di vê rewşê de, hin şert û mercên der barê mafên zimanî yên kurdên li Başûrê Kurdistanê pêk hatin. Bi temamî bicihanîna van şert û mercan, ji bo kurdên li Iraqê, bû têkoşîneke din a dirêj.

Beşa dawî ya Kurdistanê heta piştî Şerê Cîhanê yê Duyem, bi salan di bin emrê Fransa de ma. Di sala dawî ya şer de xebatên bi lez hatinkirin.

Tevî ku Cemiyeta Miletan di nîvê salên 1930an de xebatên xwe rawestandibû jî, wê hebûna xwe bi awayek fermî domand û encax, bi girêdayi damezrandina Neteweyên Yekbûyî (1945) piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn ve, hate betalkirin.

Di sala 1946an de, dema ku Fransa amade bû ku Komara Erebî ya Sûriyê wek dewleteke serbixwe ji Neteweyên Yekbûyî ya nû avabûyî re pêşniyar bike, Neteweyên Yekbûyî, pêşniyara vê hêza desthilatdariya demdirêj û kolonyalîst bêdudilî qebûl kir. Neteweyên Yekbûyî, bêyî ku ti astengiya li ser parastina kurdên li bakurê wir bike, cih de serxwebûn da Komara Erebî ya Sûriyê.

## Çi hat serê Rojhilat / Rojhilatê Kurdistanê li Împaratoriya Qacar an Îrana Pehlewî û li Komara Îslamî ya Îranê

Û li Îranê, ya rastî jî li Împaratoriya Qacarî ya ku ji aliyê rojhilat ve li sînorê Împaratoriya Osmanî, rewşa kurdan li wir çawa bûn?

Berevajî Împaratoriya Osmanî, ev dewleta pir-neteweya beşdarî Şerê Cîhanê yê Yekem nebûbû û di serî de ji peymana Versailles û bûyerên piştî wê bandor nedît. Lêbelê, dema ku Tirkiyeya nû ava bû, Pehlewî hikumdarê Qacarê jê xist û xanedana Pehlewiyan damezrand. Bavê Riza Şah bi îradeya xwe ya azad dest pê kir ki împaratoriya pirneteweyî ya berê (Weka Împaratoriya Osmanî) veguherîne dewleteke neteweyî ya navendî û ew ji gelek aliyan ve bi Ataturkê li Tirkiyê re li ser heman xetê bû û mîna wî, li ser rêyeka alîgirî ya Hîtler meşiya; her çiqas herdu dewlet, Tirkiye û Îran, karîn ku di dawiya şer de nebin ji aliyê xusirî. Ew, bi dewletên li Şerê Cîhanê yê Duyem de biserketî re, helbet alîgirê komara biçûk a Kurdistanê-paytexta wê Mehabad bû- bûn. Ev komar ji aliyên kurdên ji her çar parçeyên Kurdistanê di çerxa şer de amadekirî ve, di sala 1945an de hat avakirin an jî di Rêbendana 1946an de hat îlankirin. Bi qasî heta saleke, wan karîbûn bi awayekî demokratîk û aştiyane bi hev re bijîn; di vê demê de, Pehlewiyan nûçeyek wergirt ku di Nîsana heman salê de ji aliyê Neteweyên Yekbûyî ve, ku ew di sala 1945an de hatiye damezrandin, serxwebûn hatiye dayîn li

dewleteke din a neteweya ereb, ku beşek ji axa wê di Kurdistanê de bû. Komara biçûk a Kurdistanê dema ji aliyê serokê wê, ku di Adara 1947an de ji aliyê Îrana Pehlewî ve hat îdamkirin Komar radest bû.

## 1946 tenê nîv-dem bû! Piştî wê, siyaseta qirkirina kurdan a di navbera Şerê Cîhanê yê Yekem û Şerê Cîhanê yê Duyem de û zextên li ser parçebûna neqanûnî ya kurda weke neteweyeke çandî berdewam kir.

Îrana Pehlewî, bi têkiliyên baş ên kurê Riza Şah bi DYE re di dehsalên Şerê Sar de girêdayî bloka rojava bû, bi taybetî jî ji ber ku Riza Şah têkiliyên baş bi Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê re danîbû.

Ev yek, dema ku Şah di sala 1979an de di pêvajoya Soreşa Îslamî ya bi serokatiya Ayetullah Xumeynî de jê ket û Komara Îslamî ya Îranê hate damezrandin, ji nişka ve guherî. Kurd li Rojhilatê Kurdistanê hewl dan ku pêşniyaran ji şoreşgerên Îslamî re bikin ku ew çawa dikarin di herema xwe ya Kurdistanê de otonomiyek bi dest bixin.
Lê ev hewl bi kêr nehat, kurdên li wir rastî êrîşa leşkerî hatin, rastî nifira (Fetwaya) Ayetullah Xumeynî hatin û di dawiyê de jî, piştî şerê demdirêj yê Iraq û Îranê dest pê kir, ji aliyê artêşa Îranê ve hatin dorpêçkirin.

Dema ku 10 sal berê li Îrana Îslamî xwesteka azadiya zêdetir qelîqî, kurdên azadîxwaz ên Rojhilatê ji mêj ve tevlî vê qeliqînê bûbûn, ku vê rewşê têsirên navxweyî heta li Îranê jî kiribû. Ev yek ji aliyê Tehranê ve hat dîtin: Dema ku dor tê ser azadiya zêdetir, kurd bi beşdarbûna xwe bextewer dibin ku ev jî dibe sedem ku şert û mercên taybetî li ser wan werin sepandin. Di roja bîranîna Jîna ya ji Rojhilatê Kurdistanê de, ku di dema serdana Tehranê de piştî gengeşiya bi polîsên exlaqî re li ser awayê rast yê lixwekirina dolbendê jiyana xwe ji dest da, hin şertên teqez li ser herêma wê hatin danîn.
Li ser çawaniya organîzekirina roja bîranînê ya li Rojhilatê talîmat hatibû dayîn. Lê ev yek pêk nehat. Kurdistaniyên li Rojhilatê Kurdistanê bi çalakiyên greva giştî Jîna bi bîr anîn.

## Parlemana Ewropî ragihand ku ew dê, di sala 2023an de, Jînayê û tevgera azadiyê ya li Îranê bi xelata Sakharov rûmetdar bikin.

Em bi vê biryara parlementeran kêfxweş in.
Tê zanîn ku Jîna ji Seqizê dema ku ji aliyê polîsên exlaqî yên Tehranê ve hat sekinandin bi wêrekî xwe parast. Di 16ê Îlona 2022an de, dema hê ew di girtîgehê de zordarî lê hatiyê kirin û wê jiyana xwe ji dest da. Ji ber vê yekê, ew dê Xelata Azadiya Raman ya Sakharov a îsal piştî mirinê werbigire.

Di heman demê dê ev xelat ji bo “Jin, Jiyan û Tevgera Azadî li Îranê” bê dayîn, ku ev tevger a bi wêrekî û têkoşîna wan a organîzekirina xwenîşandanên aştiyane ya bi taybetî ji aliyê ciwanên seranserê Îranê ve hati kirin, pirr bala cîhanê kişandiye li ser xwe. Lê piştî tedbîrên tund û hovane yên hêzên ewlehiyê li dijî xwendekar û ciwanên xwepêşander standî, li Îranê dîsa bêdengî hasil bûye.

# Selman Ruşdî, nivîskar û xwediyê Xelata Nobelê, bêtira vê dixwaze

Selman Ruşdî, ku wek mirovek jîr, wî demî ji aliyê Ayetullah Xumeynî ve bi fetwayê hat la’netkirin û di bicihanîna fetwayê de xurtî ji êrîşa fenatîkekî Şîa xelas bû, di hevpeyvînekê bi minasebeta nûçeya xelatê li pêşangeha pirtûkan de xwe wiha anî ziman:

*"Min bi rastî pirr qîmet da tevgera xwepêşandan û xwenîşandana jinan a li Îranê û ez ê bi rastî minêkar bibim ger ku hikûmetên Rojavayî zêdetir bala xwe bidin vê yekê û li şûna ku hewl bidin ku hikûmeta Îranê li ser desthilatdariyê bihêlin, piştgiriyê bidin vê pêvajoyê."*

Divê Rojava vê daxwaz û şîretê rast fêm bike û bi kar bîne, bi taybetî jî derbarê Tirkiyeyê de.

# Kurd naskirinê dixwazin, dixwazin bi nav bibin

Em tenê dikarin vê yekê bipejirînin û lê zêde bikin ku -Kurdan- helbet ferq kirin ku Jîna di daxuyaniya çapemeniyê ya Parlamentoya Ewropayê de wek "Jineke kurd-Îranî" hat binavkirin. Beriya niha jî, navê Jîna di çapemeniya cîhanê de tenê bi tesnîfkirina hemwelatîbûna xwe ya “Îranî” hatibû binavkirin, ku ev binavkirin tenê ne bes e û tenê behsa astekê dike, wek “Ewropî”. Hemî Ewropî Ewropî ne, lê ew di heman demê de ji vê zêdetir in jî, û ZEDÊTIR ji her Ewropî re girîng e.

Hêjayî gotinê ye em bêjin ku peyvên sereke yên ku ji bo danasîna tevgera azadiyê ya li Îranê tên bikaranîn, ji zimanê kurdî tê, ku ji aliyê zimannasî ve ji farisî kevntir e. Tevgera Jin-Jîna-Azadî, bi heman navî, li gorî çanda kurda, li quncikekî bi temamî cudayê Kurdistanê, ango li herêma kurdan ya li Rojavayê ku li Bakurê Sûriyê û di demekê ku şerê Sûriyê yê navxweyî li parçeyên din gur bûbû de, derket holê.

Jixwe dostên kurdan û Rojavayiyan li ser hêza çandî ya nûjen a vê beşa Sûriyê, ku hê jî beşek bi xweseriya xwe tê birêvebirin, gelek tişt ragihandine. Lê dîsa jî Tirkiye, bi kêmanî beşeka wê dagir dike da ku bi jicîhûwarkirina bi zorê guncaniya civakî biguherîne. Û ew berdewam dike ku ji hewayê mirin û wêrankirina bireşîne li ser heremên kurda yên derdorê, serde jî ew di asta têkildar - ya dewletan de- berpirsiyar neyê ditîn.

# Şerê li Ewropayê niha di asê bûye

Şerê Rûsya û Ûkraynayê ev 20 meh in bêyî agirbest jî dewam dike. Dîrok û rastiyên der barê şer de hatine jibîrkirin.

Erdên her du dewletên şerker yekcar parçeyekî yekbûyî yê Yekîtiya Sovyetê bûn, ku ew di destpêka salên 1990î de ji hev belav bû û ji holê hat rakirin. Digel ku Rûsyaya nû niha - ji

hêla erdnîgarî ve - beşek Ewropî û beşek Asyayî ye, lê axa Ukrayna bi tevahî li Ewropayê de cih digire.

## Şerê di navbera du dewletên ku ji Yekîtiya Sovyetê qetayî

Di vî şerî de hema bêje bê îstîsna, di warê însanî û siyasî de Ukrayna ji aliyê Ewropa û dewletên Ewropayê ve tê pişgirîkirin. Û ji aliyê YEyê û Brukselê ve jî. YEyê niha li ser disekine ka gelo mimkun e ku danûstandinan bi welatê şer dike (Ukrayna) re ji bo endambûna YEyê, bike endam. Dewletên Ewropî jî bi sîstemên çekan, perwerdehiya leşkerî jî di nav de, piştgiriya Ukraynayê dikin, lê bi qestî dûrahiya xwe ya pêwist diparêzin da ku wekî beşdarek çalak di şer de xuya nekin. Heman tişt ji bo welatên Amerîkaya Bakur, DYyê û Kanada jî heye. Ji bo NATOyê jî heman rewş heye. NATO di heman demê de li ser disekine ka gelo niha mimkun e ku Ukrayna beşdarî hevalbendiya parastinê bibe an na. Rûsya jî li aliyê din e. Rûsya, her çiqas piştî salên ku wek dûkelek bêagir, dest bi şer kir û ji aliyê Rojavayê siyasî ve bi berfirehî weke êrîşkarekî hat rexnekirin, di asta Neteweyên Yekbûyî de jî, lê karî ku bi awayekî dîplomatîk û siyasî li hember vê yekê bisekine û ji aliyê çend welatên li çar aliyê cihanê xweşbinî dit, ku heta Rojava jî li vê şaşwaz bû. Encam wekî asê ye.

## Tirkiye beşdarbûna welatên ku dixwazin tevlî NATOyê bibin, wek hemberdanek siyasî, asteng dike: Zilmkirina çalak a li ser PKK, ‘’wek rêxistineke terorîst’’

Beriya şerê Rûsya û Ûkraynayê, Fînlandiya û Swêd hewcedariya tevlîbûna NATOyê nedîtin. Xelkê van deran xwe ewle hîs dikirin. Gelek kurdên ku li Tirkiyê zilm û zordarî li wan tê kirin jî reviyan van welatan, û mafê penaberî û piştgiriya çandî wergirtin. Piştî destpêkirina şerê êrişkar yê Rûsyayê li dijî Ukraynayê, gava ku Fînlandiya û Swêd ji bo endamtiya NATOyê serlêdan kirin, Tirkiyê (Ji sala 1952an ve endamê NATOyê ye) serlêdana wan asteng kir. Divê ewil dewlet di çewisandina PKKê de werin li ser xeta Tirkiyeyê. Bi vî awayî mafê vetoya li ser hin mijaran, ku endamên di vê rêxistina NATOyê xwedî vê mafê ne, belkî berê qet nehatibû bikaranîn.

Fînlandiya di nav her du welatan de ya yekemîn bû ku li gorî daxwaza Tirkiyê teslîm bû û di destpêka îsal de karî bibe endamê NATOyê. Serokê dewlet û hikûmeta Tirkiyê di civîna NATOyê ya li Vilniusê de tenê ji Swêdê razî bû, lê encax di 23ê Cotmehê de protokola endamtiyê ya îmzekirî ji bo erêkirinê pêşkêşî parlamentoya Tirkiyê kir. Ji ber ku di wî demî de, demeke kurt a beriya 100 saliya damezrandina Tirkiyê, serokê dewlet û hikûmeta Tirkiyê, difikirî ku dê çawa ji welatê wî yê yekbûyî re feydê ji şerê nû yê li Rojhilata Navîn ku ev 14 roj bû berdewam dikir, bigire.

**Filistîn û Kurdistan - Ji pênûsa hevnavê me analîzek li ser van her du kompleksên pirsgirêkan heye, ku di nav vê analîzê de rewşa Xezayê ya piştî sala 2007an, dema ku Hamasê dest danî ser Zîvala Xezayê, navçe û nifûsê.**

## Cureyek nû ya şerê Rojhilata Nêzîk, ji 7ê Cotmehê ve

Êrîşa terorîstî ya ji Kerta Xezayê ve hatî, ji bejahiyê, ji behrê û ji hewayê ve hat. Xuyaye ku ev bû surprîzek. Êrîş ji aliyê rêxistina Hemasê ya Filistînî ve, ku ji sala 2007an vir ve herêma Xezayê û nifûsa wê ya Filistînî kontrol dike, hat kirin. Êrîşa terorîstî ya ji bejahiyê ve gundên nêzîkî sînor hedef hat girtin û hat armanckirin heta ji wa bê dîlgirtiyên Îsraîlî bistînin û ev armanc pêk hat.

## Îsraîl piştî terora Hamasê ya di 07.10an: 'Em di şer de ne'

Îsraîl cih de navê dijmin da: Hamas. Her wiha xilaskirina vê rêxistinê weke armanceke şer îlan kir û ji wê demê ve heta niha jî li hember gelek xwepêşandanên alîgirê Filistînê yên li seranserê cîhanê, li ser vê helwesta xwe disekine.

Cîhan rastî polarîzasyonek, ku hemî medya her tim başdar e, nedîtî nebînandî hat. Mijarên acizker ên wekî antîsemîtîzm, dijminatiya Cihûyan û Îslamê êdî ne tabû ne û mîna nûçeyên şer, her gav hestan geş dikin. Heçko her tişt li ser vî şerî tê axaftin, tenê kurd û welatê wan Kurdistan li derve mane.

Ji bilî medya û çalakiyên protestoyî, Îsraîl - bi alîkariya Neteweyên Yekbûyî û bi tekane ji hêla gelek dewletan ve - rêyek dît ku şerê li dijî Hamasê li herêma Xezayê bidomîne û di heman demê de dest bi tedbîran kir an destûr da ku alîkariya ewlekariya rewşa xelkê sivîl li Xezaya Filistînê bike.

Elmanya, DYA û NATO di qonaxa destpêkê ya vî şerî de bi awayek xurt li kêleka Îsraîlê cih girtin. Tevî ku Îsraîl di sala 1948an de hatiye damezrandin, wek Tirkiyê ne endamekî fermî yê NATOyê ye jî, ew hevkarekî NATOyê bi salan berê temînatekê parastina wê di egera êrişekê de daye.

## Hamas bi çek û piştgiriyek baş hatiye parastin

Bi saya taktîka wê ya dîlgirtinê di dema êrîşa yekem de û hêza wê ya leşkerî ya ecêb, Hamas di destpêka pozîsyonek baş de bû. Sîstema serdaban a li Xezayê jî, ku bi armanca parastinê hatiye çêkirin, li vê başbûnê zêde kir. Diyar e ku Hamas di warê aborî de kêm nakeve. Ev yek bi biratiya di navbera Îrana Îslamî û hin rêxistinên filistînî de tê dîtin. Ev hemî di dema Şoreşa Îslamî de, bi rêberê şoreşger Ayetullah Xumeynî û rêberê RRF (Rêxistina Rizgariyê ya Filîstînê) Erefat dest pê kir, ku ev rewş piştî damezrandina Komara Îslamî ya Îranê, li eksenek li dijî Îsraîlê hate berfirehkirin. Ji dema ku Hemasê di sala 2007an de Kerta Xezayê kontrol kir ve, ev rêxistina terorîst kariye pişta xwe li piştevaniya eşkere ya Komara Îslamî ya Îranê rast bike. Weke ku bi Îranê re, Hamas bi cîranên xwe Lubnan û Sûriyê re jî têkiliyên baş danine. Herdu dewletan jixwe ji Îrana Îslamî sûd wergirdigirin û bi qasî Hamasê bi Îranê ve girêdayî ne.

Eksana ku di navbera Îrana Îslamî û dewletên Lubnan û Sûriyê yên Deryaya Sipî û heta Xezayê pêşketî, divê weke toreke ku ji gelek kom û rêxistinên ku kêm an zêde pêwendiyeke wan a nêzîk, pêwendiya fînansî jî nav de bi Tehranê re heyî, were fêmkirin.
Ji ber ku ev pêwendiya nefermî, lê saxlem di navbera Komara Îslamî û peravên Deryaya Spî de çêbûye, ji niha ve wek “derbeya herî mezin a Ayetullah Xumeynî” tê binavkirin.
Pêvajo û bûyerên bi motîvasyona siyasî jî dikare bi rêya tora di navbera dewletên li ser vê eksenê, bê pêkanîn. Ji ber sedemên curbecur, Iraq ne di rewşekê de ye ku li hember vê yekê gavan bavêje. Ji destpêka şer û vir ve, hejmara êrîşên li ser navendên leşkerî yên Amerîkî li ser xaka wê bi awayekî berbiçav zêde bûye, û tê îddîakirin ku berpirsyarê van êrîşa rêxistinên terorîstî yên bi eşkereyî têkiliya wan bi Tehranê re heyi ne, ku jimareya wan ji 40an zêdetir.
Li hember vê rewşê, di pêşerojê de xerabûneka têkiliyên dîplomatîk ên di navbera her du welatan de were hêvî kirin. Lê ev yek, ji sala 1980an vir ve di navbera DYE û Îranê de nemaye. Lê Îranê dikaribû retorîka xwe ya li hember DYA zêde bikira, lê heta niha ev yek nekiriye, belkî tê wê wateyê ku Tehran tercîh dike ku hîn jî li benda Şerê Rojhilata Nêzîk bimîne û temaşe bike.

## Tirkiye xwe li dijî Îsraîlê bi cih dike

Piştî 14 rojên baş ên şerê nû yê Rojhilata Navîn, piştgîriya Tirkiyê li pozîsyona destpêkî ya baş zêde kir, berî pîrozbahiyên sedsaliya vî welatî. Erdogan beriya salekê salveger bi peyameka serbilindiyê ragihandibû ku wê sedsala pêş de ji bo Tirkiye û tirkan pir baş be. Dûv re, li seranserê salê bêdeng çêbû. Û niha jî, gotina ji aliyê serokê dewlet û hikûmeta tirk bi xwe di 25ê îlonê de li ber çavê hejmareke mezin a endamên AKPê: "Hamas ne rêxistineke terorîst e, lê rêxistineke rizgarîxwaz e".

## Hamas - rêxistineke rizgarixwaz e li gor Tirkiyê

**Heyf, wî NATO û dewletên NATO yên ferdî neçar kiribû ku îsal dîsa PKKya kurd wek rêxistineke terorîst bi nav bikin.**

Ji salên 1980yî ve, pejirandina PKKê weke rêxistineke rizgarîxwaz ji destpêkê ve ji bo Tirkiyeyê nayê qebûlkirin û wê tercîh kir ku li dijî PKKê şerekî qirêj bimeşîne, ku di vî şerî de gelek qurbanî dan û parçeyên mezin ên Kurdistanê li Tirkiyeyê wêran kir. YEyê jî, di pêvajoya danûstandinên endamtiya Tirkiyê de, ku ev çend sal in berdewam dikin, nekarî wê razî bike ku divê ew hin mafan bide kurdan ku ev yek ji bo endambûna Tirkiyê pêwîst in. Ji ber vê yekê muzakereyên endamtiyê hatin betalkirin.

Ya Tirkiye dixwaze- divê PKKya kurd wek rêxistineke terorîst bê dîtin û bi awayekî aktîf were çewisandin- û Hamasa ereb-Filistînî jî wekî rêxistineke rizgarîxwaz bê qebûlkirin.
Ev du kevirên bingehîn ên siyaseta navxweyî û derve ya Tirkiyê ne, ku Erdogan yekem car di NATOyê de di çarçoveya şerê êrişkar yê Rûsyayê ya li dijî Ukrayna (Ku ew hîn ne endamê NATOyê ye) û vê dawiyê jî, demek kurt a berî pîrozkirina sedsaliya welatê xwe, li Stenbolê, lê rasterast xîtabî Rojava kirî de  eşkere kir.

Di çarçoveya şerê nû yê ku li Rojhilata Navîn berdewam e, Rojava, berî her tiştî Îsraîl û NATO ye, ku wê soz daye ku ger hewce bike ew dê Îsraîlê biparêze û hemû ew dewlet in, ewil DYA, YE û bi taybetî Almanya, ku wan jî hevalbendiya xwe ya taybet bi Îsraîlê re ragihandine.

Hêjayî gotinê ye ku Erdogan li hember DYAyê şêwaza xwe ya biçûkxistinê ya weke Îrana Îslamî bi kar tîne, niha li dijî Rojava weke Îsraîl jî tê de ye, bikar tîne.

Ne hewce ye ku PKKya kurd bê biçûkxistin, ew PKKê nahesibînin, PKK her tim dijmin bû û divê bi tevahî li dijî wan têbikoşin. Tirkiye ti carî ji agirbestên ku ji aliyê PKKê ve hatine pêşkêşkirin qebûl nekir. Ji sivîlên kurd re ti molet neda. Li şûna wê, daristan û zeviyên wan kurdan ji aliyê artêşa tirk ve hatin şewitandin. Dilovaniya ku Erdogan ji bo Filistîniyan nîşan dide evqas e.

**Bi kurtasî,** şirovêya ku di destpêkê de hatî kirin rast e. Wisa xuya nake ku rewş baş dibin an sivik dibin, heye ku rewş pir xirabtir bibin.

Beriya niha jî ji aliyê dewletên cîran ve li dijî Îsraîlê êrîşên bi roketan hatibûn kirin. Lê dîsa jî, Îsraîl ev çar hefte ne, ne di warê siyasî û ne jî yê leşkerî de, teslîm nebûye. Dibe ku ev bibe şerekî demdirêj û heta bibe şewatek jî.

## Di derbarê bûyera me ya 03ê Berfanbarê de

Amadekariyên ji bo yekemîn çalakiya me ya mezin ji dema damezrandina me ve têne kirin. Em jî niha dawetiyeyê xwe dişînin, em dê bêtir jî bişînin.

Hevnavê me yê bêhempa Cemal Nebez, bi tenê 5 sal piştî çûyîna wî, îsal dê bûbûya 90 salî. Em dixwazin wî, ji bo serkeftinên wî di salên dirêj de ji bo kurd û Kurdisanê kirine, rûmetdar bikin.

Serde jî, weqfa me isal yekem car xelata Cemal Nebez da. Jineke ku di bin şert û mercên dijwar de, bi awayekî mîna Cemal Nebez, di salên xwe yên biçûk de, kar kiriye û berdewame li ser karê xwe xelat kir. Em li bendê ne ku bi pêşkêşkirina plaketa xwe ya xelata Cemal Nebez, Zara Mihemedî, bi guncawî, rêzdar bikin.

Digel hemû hêviyên xweş û silavên xweş,
Bila em bi xwe bawer bin.

Rêz û silav

**Dezgeha Cemal Nebez**

**Fermî û bêberjewendî**

**Kontakt**

az

## Kontakt

Telefon: +49 (0) 30 86 12 653  I  Fax: +49 (0) 30 86 15 706

Em ê kêfxweş bibin ku hûn bibin aboneya bultena me, an bi riya malpera me:
https://www.jemal-nebez-stiftung.org/ oder direkt an: info(at)jemal-nebez-stiftung.org